# Nameya  Roja Şanogeriyê

## Damezirandina Şanoya navneteweyî ITI

## Saziya Cîhanî ya bikaranîna Huneran

Nameya roja cîhanî ya Şanogeriyê 2020, amadekirina Shahid NEDEEM,

27ê Avdara 2020ê

**Rûnivîsa Kurdî ji ber ya resen (İnglîzî)**

**Rûnivîsa kurtkirî**

**Shahid NEDEEM, Şanonivîs, Pakistan**

**Şanogerî weke Rûgeheke Pîroz**

Di dawiya pêşkêşkirina Komşanoya Ajoka[1] ji şanoyekê re li ser helbestvanê Sûfî Bulleh Şah[2], kalemêrek û xortek pê re, ber bi şanogerekî şanoyê ku bi rola kesayetiyeke gewre ji Sûfiyan[3], hatin. Kalemêr jê re got: " Neviyê min nexweş e, hêvî dikim tu hilma xwe ye pîroz bi ser wî de berde!" Şanoger ber bi paş ve vegeriya û got: "Ez ne Bulleh Şah im! Ez tenê

---

[1] Komşanoya Ajoka: Di sala 1984ê de hatiye damezirandin. Peyva Ajoka di zimanê Bencabî de, tê wateya "Hevdem". Pêdiviyên wê şanoyê derbarê babetên mîna lêborîna ayînî, aştî, tundiya zayendî û mafên merovan in.

[2] Sufism (Sûfîtî): Kevneşopandina Xwedênasiyê di ola Misilmaniyê de. Helbesta ayînî, bêhtir bi mûzîkê tête pêşkêşkirin, têgeha yekîtiya Sûfî di riya nîşankirinên hezkirina kirêt re.

[3] Bulleh Şah (1680 – 1757): Helbestvanekî Sûfî Bencabî ku xwedî bandor bû. Wî bi zimanekî hêsan li ser mijarên tevlîhev yên felsefî nivîsiye. Wî bi awakî tund rêgeha Ortodoksî rexin dikir. Ew bi zendîqbûnê hatibû tawanbarkirin, loma jî binaxkirina wî li goristana bajêr hatibû qedexe kirin. Di dema dabeşbûna olî de, ew cihê dilxweşiyê bû.

şanogerekî şanoyê me û bi vê rolê radibim, ez Avatar[4] im ji kesayetiya wî re." Ji nişka ve, ramaneke nuh derbarê şanogeriyê li me derket, çunkî şanoger dibe laşbûyîneke nû ji giyanê kesayetiya ku wê dinimîne.

Vedîtina çîrokên mîna çîroka Bulleh Şah, û gelekên din jî weku wê, di hemî çandan de hene ku, dikarin bibine pir ji bo girêdanê di navbera me şanogeran û bînerên tênegihiştî lê dilgerm de, ava bikin. Dema me şano pêşkêş dikir, em carinan di nav bîr û bawerî û felsefa xwe derbarê şanogeriyê de, dûr diçûn. Em bi rola pêşdîtina guhertinên civakî radibûn û me beşekî mezin ji gel li pey xwe dihişt. Di têkildariya xwe bi çareserkirina astengên îroyîn de, me xwe ji derfetên guherîna ezmûnên giyanî yên dijwar ku şanogeriyê didan der, bêpar dikir. Di vê cîhana îroyîn de, tundrewî, nefret û dijwarî careke dî xurt bûne, rojgera ku em li ser dijîn bêhtir û xurtir ber bi bobelateke keş û seqayê ve diçe. Lewra, Pêdivî ye em ji nû ve hêza xwe ya giyanî xurt bikin, û em xebatê dijî xemsarî, westan, bêhêvîbûn, çavbirçîtî û paşguhkirina vê cîhana ku em tê de dijîn, bikin. Şanogerî xwedî rol e. Ew di çalakirin û pêşvebirina merovahiyê de, xwedî roleke payebilind e, da ku xwe ji jêrketina ber bi kortalê ve dûr bixe. Ew dikare şanogehê, cihê pêşkêşkirina şanoyê ber bi pîrozbahiyê ve bilind bike. Li Başûrê Asiya, berî ku hunermend derkevine ser şanogehê, ew bi şêweyekî rêzgirtinê destên xwe didinê. Ev jî kevneşopandineke kevnar e ku, dema tiştekî giyanî û yekî rewşanbîrî bi hev re dibûne yek, dihate bikaranîn. Niha ew dem hatiye da ku têkildariyê di navbera hunermend û bîneran de, di navbera demên borî û siberojê de dîsa bidest bixin. Bikaranîna şanogeriyê dikare bibe karekî pîroz, û şanoger (acter) jî dikarin bibine *avatarên* rola ku pê radibin.

**Wergerandina ji İngilîzî : Gurgîn Îsa (Dilovanê Deştê)**

**KOMA ŞANO, QAMIŞLO**

[4] Avatar: Li gor çanda Hindî ye ku tê wateya laşbûyîn yan dubarexuyakirina giyanê kesayetiyeke pîroz di laşê peyrewekî sax de.